# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (81)-taybet:
# Du sal ji dagîrkirina Turkiyê.../103/qurbaniyên pakrewan û bêgunehên sivîl, jê /15/zarok û /11/ jin

**Wergerandin ji Erebî**

Du sal di ser dagîrkirina Turkiyê, li 18 ê Avdara 2018an z, ji herêma Efrînê - Bakur Rojavayê Sûriyê re, bi alîkariya milîsên, ku bi (Artêşa niştimanî ya sûrî û azad) tê navdan, û Hemahengiya (itîlafa) sûrî - ixwanî, û di bin perda fetweyên "Îmam Elxetîb", "zanyarên Misilman ên tundrew" û " Encûmena Islamî ya sûrî - Istanbol" de, derbas dibin... Û binpêkirin û tewanên curbecur, bi gavên rêkûpêkirî û siyasetên nijadperest - Osmaniya nû û timayên ferehkirinê ya Anqerê û destlatên wê, ya ku, navnîşana herî berz jê re, cîbicîkirina guhertina demografî (bêtirî /200/hezar nişteciyên Kurd ên resen koçber bike - ji bilî yên berê koçber bûne - û li şûna wan bi sedhezaran ji malbatên çekdar ên milîsan û koçberên Xota û gundewarên Humis, Hema, Idlib û Heleb niştecîkirin bide... Da ku, rêjeya hebûna kurdî ji %95 daxîne %20 a niha) hîn jî berdewam in.

Di siya fewdalîzim û serberdayetiya berdewam de, ya ku, virûvût û gotinên destlatên Turkiyê û dirbekciyên wê yên dibêjin, ku asa û hêminî li herêmên Suriyê yên ku dagîr kirine de peyda dibe, diyar û tazî dike .

Ji bilî yên wendayî û revandî yên bêçarenûs, û girtiyên ku bi zorê hatine veşartin; /103/ qurbaniyên pakrewan û bêgunehên sivîl, ji xelkê herêma Efrînê, di siya dagîkirinê de (18 ê Avdara 2018an z - 17 ê Avdara 2020an z) û ji nav wan /15 / zarok û /11/ jin, jiyana xwe ji dest dan. Ew tev - ji bilî yên li herêmên penaberiyê bi teqînên bombeyên zemînî yan di bin zext û fişarên jiyanî yên hişk de, ji ber dagîrkeriyê - di mercên cuda de, hin di bin işkencê de yan bi qurşînê, û hin jî bi teqînên bombeyên zemînî, yan bi îdamê, yan li ser sînorê Turkiyê, yan jî di encama bombebarana herêmên penaberiya koçberên Efrînê (gundewar û bajarokên Şehba û Şêrewa - Bakurê Heleb) hatin kuştin û mirin.

**Ew cangorî ev in:**

**1-** **Moherem Xoce** , ji gundê Çeqela 1984 - navca Şiyê, li navîna Avdara 2018 an , piştî ku hêzên dagîrker derbas gund bûn, û ew revandin û işkence kirin.

**2-** Ciwan, **Husên Ebid Elrehman Husên** /24 / sal.

**3-** Ciwan, **Welîd Soranî kurê Cemîl** /18/ sal.

Û ew herdu ji xelkê gundê Çeqelê Cûmê ne, û li kastîna dibistaneke bajarê Efrînê, li rojên destpêkê ji dagîrkirinê, bi qurşînê hatin tunekirin, û dema binaxkirinê di goristana gund de, gund dorpêç kirin û nehîştin xwedî termên wan bibînin.

**4-** **Ebdo kurê Hemo Fûad Nasir**.

**5-** **Fûad kurê Heso Ebdo Nasir**.

Û herdu ji gundê Qîbarê ne, li 24/3/2018 an , di encama teqîna bombeyeke zemînî de , jiyana xwe ji dest dan.

**6-** **Omer Memo Şemo** /66/sal, li 10/5/2018an , termê wî di malê de , li gund , ku bi qurşînekê di sîng de , bi destê milîsên çekdar kuştî dîtin.

**7-** **Bîlal Hemo** /66/ sal, ji gundê Xilalka - navça Bilbilê, li destpêka Nîsanê 2018an, bi destê milîsên çekdar ên, ku gund dagîrkirine hate kuştin.

**8-** **Henan Ne'isan**, li 7/4/2018an, li navenda bajarê Efrînê - piştî ku li ser destê milîsên çekdar tûşî işkencê hat - mir.

**9-** **Ebdo Arif Ibrahîm** ji gundê Kaxrê - navça Şiyê , li navîna Nîsana 2018an , di bin işkencê de , li ser destê "Lîwa'i Elsultan Silêman Şah" hate kuştin.

**10-** Hunermendê gelêrî **Qadir Mohemed Kilislî**.

**11-** **Xalid Kilislî kurê Qadir**.

Herdu , bav û kur ji gundê Celemê ne , di bin işkencê de , li 29 /4/2018an, bi destê milîsên çekdar hatin kuştin.

**12- Şiyar Henîf** yê Ciwan , ji gundê Qestelê Xidriya - navça Bilbilê , li 4/5/2018 an, bi teqîna bombeyeke zemînî - dema ku, bi tirektorê zeviyê zeytûnan dajot - mir.

**13- Receb Şukrî Reşîd** ji gundê Derwîş - navça Reco , li 14/5/2018an , li ser destê milîsên "Ehrar elşerqiyê" , bi qurşînê - dema ku diçû navenda wan li bajarê Reco , da ku li çarenûsa kurê xwe bipirse - şehîd ket.

**14- Mustefa Ebdo Şahîn** ji xelkê gundê Avrazê - navça Mabeta , li 22/5/2018an , dema ku , bi şev , li taxa Mehmûdiyê , li bajarê Efrînê , milîsên çekdar avêtin ser malê , bi qurşînê kuştin.

**15- Ehmed Şêxo kurê Mohemed** 1968 - bajaroka Şiyê , li 11/6/2018 an - piştî ku, li ser destê milîsên çekdar ên "Lîwa'i Elsultan Silêman Şah - Elemşat" tûşî işkenceyeke zorane bi hin din re hat - şehîd ket . Ji bîr nebe , ku ew cîgirê serokê Encûmena xwecehî ya bajêr bû , yê ku, li 29/4/2018 an , ji aliyê Hikometa demkî ve , ya girêdayî Hemahengiya sûrî (Ìtîlafa Elsûrî) ya bi ser Turkiyê ve , hatibû bi cîkirin.

**16- Rifet Hemîd Hemdoş** ji gundê Kefircenê , li 12/6/2018an - piştî ku li dawiya Avdara 2018 an , hate revandin , bêtirî du heyvan hate girtin , û tûşî işkencê û zextên curbecur bû - , ew pakrewan bû .Li rex wê , ji bo serbestberdanê jî , merivên wî cezayeke diravî mezin dan.

**17- Samî Elhewa (Elqoc)** ji pêkhateya Ereb ê bajarê Efrînê ye , li berbanga 20/6/2018 an , milîsên çekdar bi ser malê de hatin û gulekirin.

**18-** Zarok , **Kemal Muhemed Elî Arif** /17/sal , ji gundê Birc Ebdalo , li 26/6/2018an , di mercên bi guman de , mir.

**19- Ehmed Ibrahîm** ji gundê Xilalka - navça Bilbilê , li 27/6/2018an , bi teqînekê di orta bajarê Efrînê de , çû ser dilovaniya Xwedê.

**20- Fatime Hemkî** (hevjîna Henan Birîm) /66/ sal , di encama avêtina bombeyekê bi ser malê de , li gundê Qitmê , li şeva 27/6/2018an , ji aliyê milîsên çekdar ve , pakrewan bû.

**21- Arif Husên Cilo** /62/sal ji gundê Qenterê - navça Mabeta , li 29/6/2018 an , di encama teqîna bombeyeke zemînî de , li rex malê li gund , çû ser dilovaniya Xwedê.

**22- Mihemed Îbiş Ne'iso** ji gundê Hec Hesna - navça Cindirêsê , li 2/7/2018an , li ser destê milîsên çekdar , di bin işkencê de şehîd bû.

**23- Hemdî Ebdo** /70/sal.

**24-** Hevjîna Hemîd, **Sultanê Xelîl Nasiro** /60/sal.

Ew herdu ji gundê Beradê - Şêrewa ne , li destpêka Tîrmehê 2018an, bi encama işkencê û gulekirinê , li ser destê milîsên çekdar - yên ku zêr , pere û çêl ji malê dizîne jî - pakrewan bûn.

**25-** Jina ducanî , **Dilovan Esmet Şêxo** ji gundê Cilbirê , bi qurşîna artêşa Turkiyê , li ser sînor , li 8/7/2018an (dema ku dixwest bi giropeke din re , li herêma Selqîn - Idlib ê re , sînor derbas bikin , da ku m ji rewşa dujehî ya Efrînê birevin) şehîd ket.

**26- Husên Şêxo** yê hiş lihevketî /52/sal , ji gundê Mûskê - navça Reco , li 12/7/2018an , di bin işkencê de - piştî çend rojan ji revandina wî , ji aliyê "Ehrar Elşerqiyê" ve - mir.

**27-** Zarok , **Fehîme Kînan Sîdo** /13/sal , ji gundê Xaziyana - navça Mabeta , li 13/7/2018an , bi teqîna bombeyeke zemînî , di nav zeviyeke zeytûnan de , mir.

**28- Samî Hec Xelîl kurê Ebid Elrehman** ji gundê Hec Hesna - navça Cindirêsê , li 15/7/2018an, bi sedema işkenca ku , giropeke çekdar bi wî û birayê wî re kirî , jiyana xwe ji dest da.

**29- Mohemed Elî Gulê Xêrî kurê Osmên** , ji gundê Birc Heyder - Şêrewa , li 22/7/2018an , bi sedema teqîna bombeyeke zemînî di makînakê de , pakrewan bû.

**30- Se'îd Mohemed Teter** /53/sal, ji gundê Ereba - navça Mabeta , li 25/8/2019an , li nexweşxaneyek Turkiyê - bi encama işkenca ku berê tûşê hatibû , ji aliyê milîsa "Mohemed Elfatih"ve - jiyana xwe ji dest da.

**31- Esmet Hebeş Henan Dîko** ji gundê Qêsim - navça Reco , li 15/9/2018 an , li nexweşxanak Turkiyê - bi encama birîna ku berê , di encama teqîna bombeyeke zemînî de , vê re çêbûbû - jiyan ji dest da.

**32- Ciwan , Mohemed Bîro**.

**33-** Hevjîna Mohemed , **Tolîn Bîro**.

**34-** Zarokê wan , **Can Bîro.**

Hersê ji xelkê gundê Şêxorzê ne - piştî ku neçar man ji dojeha Efrînê birevin - li ser riya Berad - Niblê , li 23/10/2018 an , di encama teqîna bombeyeke zemînî de , çûn ser dilovaniya Xwedê.

**35-** Ciwan , **Ehmed Nasir kurê Mehmûd** ji gundê Feqîra - navça Cindirêsê , li 24/10/2018an , di encama teqîna bombeyeke zemînî de , mir.
**36-** **Elî Beşîr Osman** /50/ sal.
**37-** Birayê Elî , **Mohemed Beşîr Osman** /38/sal.
Herdu ji gundê Goliya jorin - Reco ne , li 29/10/2018 an , bi encama teqîna bombeyeke zemînî di bin tirektora wan de , jiyana xwe ji dest dan.
**38-** **Isma'îl Îbiş Isma'îl.**
**39-** **Hemze Îbiş.**
Ew herdu ji gundê Su'iriya - navça Mabeta ne , li 7/11/2018an , bi teqîna bombeyeke zemînî , di bin tirektorê de , mirin.
**40-** Temenmezin , **Ayşe Henan** /80/sal, li gundê Birc Ebdalo , li 8/11/2018an, bi destê milîsên çekdar hate fetsandin , û zêr û mewalên hundir malê jî hate dizîn.
**41-** Zarok , **Hesen Xilo** /15/sal , ji gundê Bêxçe - navça Bilbilê , yê ku bi xwediyan re , li taxa Zêdiyê , li bajarê Efrînê dijiya ; Li 22/11/2018an , bi qurşînkirinê ji aliyê çekdarekî ve , di mal de hate kuştin.
**42-** **Mohemed Henîf Reşîd Ehmed** (malbata Zengel) , /54/ sal , ji gundê Qornê , Xwediyê guvêşgeheke zeytûnan li gundê Qestelê - navça Bilbilê , li 8/12/2018an bi nîvro , li meydana guvêşgehê , li ser destê çekdarekî , bi qurşînê hate kuştin.
**43-** **Zekî Dalî** 1980 z , di bûyereke teqînî de , li orta Efrînê - kolana Reco , li êvara Pêncşemê 13/12/2018an - digel çar kesan ji yên ku hatine niştecîkirin û me nikanî navên wan nasbikirana - jiyana xwe ji dest da.
**44-** **Mohemed Hec Elî** - gundê Coqê.
**45-** **Şiyar Şukrî Husên** - Reco.
**46-** **Berxwedan Ebid elfetah Sîdo** - gundê Kurzêlê.
**47-** **Nezmî Şukrî Mewlod** - gundê Qude.
**48-** **Mohemed Osman Ne'iso** - gundê Mîrka.
**49-** **Kamîran Menan Elî kurê Nebî** /45/sal ji gundê Avrazê.
Her şeş pakrewanên jorîn , li 16/12/2018an , di teqîna makînak Van bombekirî de , li sûka keskahiyê (soq elhal) , şehîd ketin.
**50-** Ciwanê hişnelicî , **Neşet Silêman Dawod** ji gundê Husê (Mîrka) - navça Mabeta , li 31/12/2018an - piştî ku , li 8/4/2018an , ji aliyê milîsa "Elcebhe Elşamiyê" ve hate gulekirin - mir.
**51-** **Mohemed Emîn Hesen** /25/sal , ji bajaroka Kefirsefrê , li destpêka Rêbendanê 2019 an - piştî ku di Tîrmeha 2018 an de hate revandin - di zîndaneke milîsên çekdar de , di bin işkencê de mir.
**52-** Zarok, **Ebid Elrehman Ebdo kurê Osmên** - piştî ku, di encama teqîna bombeyekê de , li gundê Kefirsefrê - Cindirês , li destpêka heyva Rêbendanê 2018 an , bi kûranî birîndar bû - , ji ber wê jiyan ji dest da.
**53-** **Cemîl Ehmed Bekir** ji gundê Xilalka - navça Bilbilê , bi teqîna otobîleke veguhesîna sivîlan ( ya ku li orta bajarê Efrînê , li 20/1/2019 an bûyer daye, û sê kesên din jî , ji yên ku li herêmê hatine niştecîkirin û me nikanî navên wan nasbikirana , vê re jiyana xwe ji dest dane - şehîd ket.
**54-** **Egît Mohemed Şêx Hesen** , di mercên bi gûman de , li navîna heyva Rêbendanê 2019an, li nêzîkî gundê wî Avrazê - navça Mabeta , termê wî hate dîtin.
**55-** **Xoşnav Fayêq Henan** ji gundê Berbenê - Reco , li 7/2/2019an , li hundir malê , li bajarê Efrînê - piştî ku du rojan ji dîkana xwe ya porqusandinê wenda bû - di mercin bi guman de , darvekirî hate dîtin.
**56-** **Elî Qelender** /85/sal ji Mabeta , li 10/2/2019an - dema ku li rojavayî bajarokê pezê xwe diçêranad - xortekî ji koçberên Xotayê qurşîn avêtê û kuşt.
**57-** **Cîhad Osman Dawod** /40/sal , ji bajaroka Şiyê , li pênc şemê ser nîvro 21/2/2019an , li kolana çûnûhata vêlata , li rex nexweşxana Dêrsim , di teqîna otombîleke bombekirî de , jiyana xwe wenda kir.
**58-** Keçik , **Lovîn Xelîl Nûrî** ji gundê Keferomê , li 9/2/2019an - di dema ku , bi hinên din re, li aliyê gundewarê Idlibê , sînorê Turkiyê derbas dikirin , û piştî ku di heyameke zor sar de , rê wenda kirin - hate kuştin.
**59-** Dermanfiroşê ciwan, **Mohemed Hemo Xelîl Eyşê** ji gundê Birîmce - Mabeta , li taxa Eşrefiyê li Efrînê , li Sêşemê 12/3/2019an , di mercên bi guman de , kuştî hate dîndin.

**60- Hûde Ehmed Mûse** ji gundê Cilbirê , li navîna Avdara 2019 an - dema ku , bi hinên din re , li aliyê Idlibê , sînor derbas dikir - hate kuştin.
**61- Mohemed Ebdo kurê Xelîl** /60/ sal, ji gundê Kibêşînê - Şêrewa , li 1/5/2019an, di teqîna bombeyeke zemînî de (dema ku, diçû gundê Mezin - Şêrewa) hate kuştin.
**62- Mohemed Ibrahîm kurê Ibrahîm** 1969 z , ji gundê Xelîlaka - navça Bilbilê , li 19/5/2019an , ji ber gelek nexweşiyên, ku ji ber işkecekirineke pir zor pêre çêbûne mir . Ew işkence , li 14/6/2018an - di dema ku, çekdar hatine pêşiyê û makîna wî tevle barê çiloyê rezan û peran jê birine - vêre hatibû kirin.
**63- Reşîd Hemîd Xelîl** 1978 z , ji gundê Bêlê - Bilbilê û nişteciyên Cindirêsê , di bin işkencê de , li roja Pêncşemê 22/5/2019an , li kêlek gundê Qestelê Cindo - Efrîn - yê nêzîk bajarê Ezazê - termê wî hate dîndin. Ew li 12/5/2019an , tev lawê wî Mohemed û hemwelatiyekî din , ji aliyê milîsên çekdar ve hatibû revanadin.
**64- Eslan Bêrem Sîno** yê bi (Eso) tê navdan, ji Bedîna ye û zayîna wî 1973 ye... Piştî ku, li 25/10/2018 an hate revandin , Li navîna Gulana 2019 an , çekdarên ku bajarokê Bedîna û gundê Qopê - Reco dersteserkirine , merivên wî bi mirina wî agahdar kirin , bêyî ku termê wî radestî wan bikin.
**65- Silêman Tobal kurê Silo** /35/sal , li 28/5/2019an bi ro , ji ber şerekî navxweyî di navêna milîsên /Ehrar Elşerqiyê/ û /Ehrar Elşam/ de , li orta Cindirêsê , qurşîneke tewşankî lêket û mir.
**66- Ebid Elrehman Şêx Ehmed kurê Bîlêl** /36/ sal.
**67- Henan Henan kurê Husên** /34/sal.
Ew herdu ji gundê Şêx - navça Reco ne , li 8/6/2019 an , li nêzîk bajarokê Mabeta , li ser destê milîsên çekdar , bi qurşînên zindî hatin kuştin.
**68- Şeref Eldîn Sîdo** ji Cindirêsê , yê ku tevlî hin din ,li 12/5/2019an hate revandin û işkencekirin , û ji ber ku xwediyên wî nikanîn berdêla ku dihat xwestin bidana ; li 22/6 /2019an , li nêzîk Qestelê Cindo termê wî kuştî hate dîndin.
**69-** Temenmezin, **Silo Tobal** , li 29/6/2019 an - piştî ku kurê wî Silêman , li 28/5/2019 , di şerekî navxweyî di nav nandoza de , şehîd ket bi heyvekê - , ew jî ji qehra re bihecî.
**70-** Temenmezin , **Elî Ebdo** ( malbata Zembo ji êla Umêrat a erebî ) , li şeva Pêncşemê 19/7/2019an , milîseke çekadar , pirojeyeke çekdar û teror avête ser malê , li nêzîk guvêşgeha Fû'ad Nasir a li ser riya Cindirêsê - bajarê Efrînê , û piştî işkencekirinê ew fetisandin , jina wî girêdan û lêxistin û malmewalê wî jî dizîn.
**71- Mihyedîn Oso** /77/sal , ji gundê Qitmê - navça Şera , li 25/8/2019an bi şev , çeteyek çekdar xwe avête ser malê ya nêzîk kaziya Eyşê ya li taxa Eşrefiyê - bajarê Efrînê , ew û hevjîna wî ya /70/salî girêdan û pir lêxistin. Bi wê işkencekirinê , ew şehîd ket û jin jî derizî û birîn bû û tirsê pêgirt . Bi ser wê de jî , sed hezar lîreyên sûrî , cîhazek xilyewî û rawtirek ji malê dizîn.
**72-** Temenmezin , **Horiyê Mohemed Bekir** (hevjîna Mihyedîn Oso) /74/sal, li 6/9/2019 an - piştî ku rojekê di nexweşxaneyeke Efrînê de ma - ji ber lêdan û birînên , ku di wê pirojeya dizînê ya çekdarane de , li 25/8/2019 an lê çêbûne , jiyana xwe ji dest da.
**73- Mohemed Hesen Weqas** ji zayîndeya bajarê Ezazê 1958 z ji pêkhateya Ereb , û nişteciyên gundê Tilifê ye. Ew û hevjîna wî li navîna Tirmeha 2019 an hatin girtin û makîna wî hate dizîn - xuya dibe ku tûşî işkencê hatibe - , ji ber wê û piştî du heftan , bi seknemejiyê mir.
**74- Mohemed Henîf Husên** /30/ sal , bi (Hemadê) dihate navdan , ji gundê Bilêlko - navça Reco ye , li 30/8/2019 an hate girtin û di navenda asayêşa Reco de hate işkencekirin . Û li 9/9/2019an, merivên wî bi mirina wî di nexweşxaneya Efrînê de hatin agahdarkirin .
**75- Amêr Silêman Omer**.
**76- Idrîs Silêman Omer**.
Herdu bira ji gundê Bafilorê - Cindirês ne , û li 24/9/2019an , li bajarê Cindirêsê , di kolaneke şaxeyî de , li ser riya Yalanqozê , bi teqînekê mirin.
**77- Zeyneb Mustefa Mûse** , li 1.10.2019an , di nexweşxaneyek bajarê Rihaniyê - ji ber birîna ku di serî de , di encama teqîna terorî ya ku, li Cindirêsê , li 24.11.2019 an çêbûye - de , pakrewan bû.
**78- Ednan Reşîd Emîr** /59/sal , ji bajaroka Meydankê - navça Şera ye. Li berbanga 4.10.2019an , li pêş malê , bi awakî yekser di serî de , gulebaran bû.
**79- Silêman Hemko** (Silêman Ebdo Çeqelî )/79/ sal , ji gundê Kenî Gewrikê - navça Cindirêsê ye.Li 5.11.2019an , di nexweşxanak Turkiyê de , ji ber birînên ku lê çê bûne , jiyana xwe umir da hazira .

Hêjaye em bi bîr wînin , ku li 2.11.2019an , milîsek çekdar bi ser mala wî ya gund de - ji bo dizînê - çû , û li wî da û işkence kir .

**80-** Keça mêrnekirî , **Nercis Dawod** /23/ sal, ji gundê Kîmarê , li 17.11.2019 an , li nêzîk gundê Gemrûkê , û di mercên ne bêlikirî de ; Termê wê li rex termê hevalê wê Elî Elşaxorî- ji xelkê Şamê - dîtin. Ji bo agahdariyê , kecik bi malbata xwe re , li bajarê Efrînê dijiya.

**81- Şewket Hesen** yê temenmezin , ji gundê Bîbeka - Bilbilê , li 22.11.2019an , li nêzîk ciyayê Qota , di navêna gundên Şerqiya û Bîbeka de - piştî şeş rojan ji wendabûnê ji malê - , termê wî hate dîndin , bêyî ku sedema mirinê were zanîn . Tiştê xuya ew e,ku herdu gund di bin serdestiya milîsên "Sultan Mûrad" de ne , û ciyê ku lê term dîtine , nêzîk rêbendeke çekdar bû.

**82- Husên Ebdelah Gul Dehdo** yê temenmezin /74/ sal.

**83- Elî Mehmûd Osman** /54/sal.

**84- Zarok , Mihemed Mihemed Elî** /11/sal.

**85-** Zarok , **Mustefa Mohemed Mecîd** /10/ sal.

**86-** Zarokê /7/ salî**, Mihemed Mihemed Omer**.

**87-** Zarokê /6/ salî , **Arif Cefer Mohemed**.

**88-** Zarokê /9/ salî**, Îmad Ehmed Kêfo**.

**89-** Zarokê /3/ salî , **Ebdo Ebid Elfetah Elîko**.

**90-** Zarokê /12/salî , **Semîr Ebid Elrehman Heso**.

**91-** Zarokê /15/salî , **Mohemed Ebid Elrehman Heso**.

Ew her deh ji xelkê Efrînê ne , li 2.12.2019an , di komkujiyeke artêşa Turkiyê û nandozên wê de - li Tilrifetê , nêzîk goristana garacê , ya ku li Rojhilatê xeta tirênê dikeve - şehîd ketin.

**92- Bêrem Mohemed Bîlal** ji xelkê gundê Penêreka - Reco , li 10.12.2019an , li Turkiyê , li bajarê Qirixanê , di malekê de - piştî sê rojana ji mirina wî - termê wî dîtin.Wî ceza xwe ya mayî di hepsa malî de diqedand.

**93-** Ciwanê /21/ salî , **Mihemed Bekir Mihemed**(bapîrê wî Husên Bekir bû) ji gundê Dumiliya - Reco , li 12.12.2019an , bi qurşînê di serî de , ji aliyê Heyit tehrîr elşam ve (Nesra berê) , li Idlibê hate tunekirin (îdamkirin).

**94- Mehmûd Sîdo kurê Mihemed** (Mehmûd Xoce) yê /70/salî , ji gundê Goliya jêrin - Reco , li 23.11.2019an - piştî serbestberdana wî bi du rojan - , bi sedeama işkencê û qehra ku li ser destê milîsa "Firqit Elhemzê" bi seknexwînê mir.

**95- Mohemed Se'îd Reşîd kurê Ebid Elmecîd** ji gundê Etmana - Reco 1961z , li 4.11.2019an , li dema ku ji navenda turkî ya kirîna zeytê ya guvêşgeha Rifetiyê - Cindirêsê vedigeriya mal ; Li geliyê Tîra , li nêzîk gundê Berbenê - Reco , (ya ku ,di bin destê milîsên "Ehrar Elşerqiyê " û "Firqit Elhemzat " de ye) hate revandin. Û di 1.2.2020an de , xwediyên wî ji aliyê milîsan ve , hatin agahdarkirin , ku termê wî li nêzîk gundê Husê hatiye dîtin.

**96- Elî Şeban Minle** /63/ sal , ji gundê Aqûbê - Şêrewa (yê ku di bin destê artêşa Sûriyê de ye), li berbanga 3.2.2020an, û bi gulebarana artêşa Turkiyê û nandozên wê ya bi ser gund de şehîd bû. Û di encam de , ziyanên şênberî jî gihîştin malan.

**97- Henan Ebdo** /15/ sal.

**98-** Kurê Henên yê yekane, **Ebid Elrehman Henan Ebdo** /13/ sal.

**99- Cangîn Muhemed Ebdo** /32/ sal.

Ew hersê ji gundê Husê (Mîrkan) - navça Mabeta ne, ew li 10.2.2020an , li navenda bajarê Efrînê - kolana Reco , li pêş firoşxana "Fetayêr Mîlano" ,di encama teqîna sîtêra mazotê de , şehîd ketin. Li rex wê jî qurbaniyên kuştî û birîndar ji sivîlên , ku bi anindindane jî hebûn.

**100-** **Emone Mensor Umer** ya /40/ salî , ji gundê Kalûtê - Şêrewa , - ya ku di bin serdestiya artêşa Sûriyê de ye - li şeva 24.2.2020an , di encama bombebarana artêşa Turkiyê û nandozên wê de , pakrewan bû.

**101-** **Hesen Hac Ezet Mihemed** /55/ sal , ji gundê Birîmce - Mabeta.

**102-** Hevjîna Hesen, **Fatîme Ehmed Elî** /46/ sal , ji bajaroka Bedîna.

**103-** Zaroka wan, **Sirûşt Hesen Mihemed** yê /12/ salî.

Hersê li gundê Aqûbê - Şêrewa (ya ku di bin serdestiya artêşa sûrî de ye) , li şeva 25.2.2020 an - bi encama bombebarana artêşa Turkiyê û nandozên wê ve - di bin bermayên malê de şehîd ketin.

Tewnên ku, di dermafê sivîlan de , têne kirin , ji aliyên ku pêgiriya xwe bi perensîpên mafên mirovan radighînin ; Pirotestokirin, şermezarî , vekirina lêkolînên serbixwe û aşkere , berbicavkirina kesên ku, di ber de berpirsiyar û yên cîbecîker , cezakirina wan û dandina berdêleke şênberî û razberî ji mervên qurbaniyan re , gereke û tê xwestin. Weke ku diyar e , destlatên dagîrkeriya Turkiyê û milîsên terorîst ên pêve girêdayî , piraniya tewan û binpêkirinan , li dijî nediyarbûnê tomar dikin , an jî gavine di ser re davêjin ; Da ku, tewanker ji sezayan biflitin , û xelkê bi tirsandin bidin , da ku bi zorane koçber bibin. Lê , Hikometa Anqerê , di ber kiriyarên ku li herêmê û dermafê xelkê wê de têne kirin , berpirsiyar dimîne. Ji ber ku , ew dewleteke dagîrkera leşkeriye û xwediyê destlateke rasteqîn e , û gavên zagonî û asayî bi rengekî rast , ji bo parastina sivîlan navêje . Bervajî wê , ew hîn li ser kiriyarên artêş û nandozên xwe vedişêre , wan diparêze û bi ser dijîtiya Kurdan - li kû dibin bila bin - ve têve dide û destek dike ; Û bi wê , jirêderketinin mezin ji zagona navdewletî ya mirovahî , belgenama Miletên Yekgirtî û hevpeymanên navdewletî re dike.

Xelkê Efrînê bang li saziyên Miletên Yekgirtî , Encûmana asayî ya navdewletî , hêzên diwelî yên di Sûriyê de çalak , rêxistinên mafane û medenî , û alavên ragihandinê yên curbecur dike ; Da ku , bi rola xwe rabin û rêgirikê ji vê binpêkirin û tewanan re dînin , û bi koçberên , ku bi zorê koçberbûne re alîkar bin , da ku , bi şêwakî asayî vegerin cîwarên xwe , û mal û milkên xwe bi dest bixînin. Herweha bi berpirsiyarî kar bikin , daku , dagîrkirina Turkiyê bi dawî bikin , û milîsên teror tune bikin , ji bo Efrîn vegere serweriya Suriyê û rêvebirina xelkê wê yên resen.

18.03.2020an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

…………………

**Wêne:** Lîstak bi wêneyên /103/ qurbaniyên şehîd û bêgunehên sivîl ji xelkê herêma Efrînê , di siya dagîrkirina Turkiyê de (18.3.2018an.z- 17.3.2020an.z) - çar lîste ne.

**Lîstak bi nav û wêneyên /103/ qurbaniyên şehîd û bêgunehên sivîl ji xelkê herêma Efrînê , di siya dagîrkirina Turkiyê de (18.3.2018an.z- 17.3.2020an.z)**



6- Omer Şemo | 5-Fûad Ebdo Nasir | 4- Ebdo Fûad Nasir | 3- Welîd Soranî | 2- Husên Husên | 1- Moherem Xoce



12- Şiyar Henîf | 11- Xalid Kilislî | 10- Qadir Kilislî | 9- Ebdo Arif Ibrahîm | 8- Henan Ne›isan | 7- Bîlal Hemo



18- Kemal Arif | 17- Samî Elhewa | 16- Rifet Hemdoş | 15- Ehmed Şêxo | 14- Mustefa Şahîn | 13-Receb Reşîd




24- Sultanê Nasiro | 23- Hemdî Ebdo | 22-Mihemed Ne›iso | 21- Arif Husên Cilo | 20- Fatime Hemkî | 19- Ehmed Ibrahîm



30- Se›îd Teter | 29- Mohemed Xêrî | 28- Samî Hec Xelîl | 27- Fehîme Sîdo | 26- Husên Şêxo | 25- Dilovan Şêxo

Lîsta /1/-18 Avadarê 2020an Amedekirin: Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn/Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

**Lîstak bi nav û wêneyên /103/ qurbaniyên şehîd û bêgunehên sivîl ji xelkê herêma Efrînê , di siya dagîrkirina Turkiyê de (18.3.2018an.z- 17.3.2020an.z)**



96- Elî Minle



95- Mohemed Reşîd



94- Mehmûd Sîdo



93- Mihemed Mihemed



92- Bêrem Bîlal



91- Mohemed Heso



102- Fatîme Elî



101- Hesen Mihemed



100- Emone Umer



99- Cangîn Ebdo



98- Ebid Ebdo



97- Henan Ebdo



103- Sirûşt Mihemed

Lîsta /4/-18 Avadarê 2020an

Amedekirin: Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn/Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê